


HERÊM Û PARÊZGEH LI NORWÊC



Li Norwêcê pênc herêm hene. Li bakûrê dûr herêma Nord-Norge heye. Di nîvê welêt de herêma Trøndelag heye. Li rojava herêma Vestlandet, û li rojhilat herêma Østlandet hene. Herêma ji başûr herî dûr tê dîtin, herêma Sørlandetê ye.

Her herêm dabeşî parêzgehan bûye. Li Norwecê 11 parêzgeh hene.

Nord-Norge

Nord-Norge hem ji bakur herêma herî dûre, û hem jî herêma herî dûr a rojhilatê Norwêcê ye.

Herêm ji parêzgehên Troms og Finnmark û Nordland pêk tê.

Ger hûn di Kanûn an Çileyî de werin Bakurê Norwêcê, dibe ku hûn demên tarî (tarîtiyê) bijîn. Dema tarî ew e ku roj bi şevûroj di binê asoyê de ye. Ronîyên Cemeseran di zivistanande li Nord-Norge têne xwûyakirin.



Ronîyê Cemesaran. Wêne: Pxhere.com

Havînê li Nord-Norge şeveroj tê dîtin. Dema şeveroj be, roj bi anjî beşeka rojê bi şevûroj li ser asoyê xwûya dikê.

Troms og Finnmark

Parêzgeha Troms og Finnmark herî dûrî bakur û rojhilatê Norwêcin, û bi Rusya, Finlandîya û Swêdê re sînordare. Tromsø bajarê herî mezin ê parêzgeha Troms og Finnmark'ê ye. Knivsjeleloddan xala ku dikevê herî bakurê Norwêcê ye, û li parêzgeha Troms og Finnmark'ê ye. Nordkapp zêdetir navdare, ku ew jî hema bêje weke Knivskjelloddan dîr dikevê. Nordkapp li Norwecê cîhekî naskirî yê geştiyarîyê ye.



Nordkapp Wêne: Andrey Armyagov, Adobestock

Hammerfest, bajarê herî bakur yê cîhanê ye, û dikevê parêzgeha Troms og Finnmarkê.

Nordland

Nordland parêzgeheke dirêj û tenge ku li ser sînorê Swêdê ye. Bodø bajarê herî mezin yê Nordland'ê ye.

Lofoten li parêzgeha Nordland'e û ji gelek giravan pêk tê. Di navbera Çile û Avrêlê de,

masîgirtina demsalî ya salane bi navê Lofotfisket, li giravên Lofoten tê birêvebirin. Gelek masîyên skrei di bin çalekîya lofotfisket tên girtin. Skrei cureyekê masîyên torsk'e û li bakurê deryaya Barents (Barentshavet) dijîn. Di navbera Çile û Avrêlê skrei diçin Lofotenê da kû hêka deynin. Gelek skrei tên girtin û hişkkirin. Ji masiyên hişkkirî re dibêjin "tørrfisk". Piraniya masiyên hişkkirî ji welatên din ên wekî Îtalya û Nîjerya'yê re tên hinartin.



Masîyên yê hişkkirî darvekirî. Çavkanî: Nærings og fiskeridepartementet

Çerxa Arktîkê di Nordland re derbas dibe. Li bakurê Çerxerêya Arktîk dema tarîtiyê (şeva nîvê rojê) û dema şeverojê (tava nîvê şevê) heye. Her çiqas yek ber bi bakur ve herê, dê ewqas bêhtir şevûrojên bi şeveroj û şevûrojên bi tarîtiyê bibîne. Li Nordkapp dema tarîtiyê ji 20'ê mijdarê (november) heta 22'ê Çileyê (januar) ye, û şeveroj ji 14'ê Gulanê (mai) heta 29'ê Tîrmihê (juli) dom dikê.

Trøndelag

Trøndelag di nava welat de ye, hem herême û hem jî parêzgehe. Herême wek Mitt-Norge jî tê binavkrin. Li Trøndelag hem fîyordên dirêj û hem jî çiyayên bilind hene. Trondheimsfjorden fîyorda herî dirêje parêzgehêye. Trollhetta çiyayê herî bilindê Trøndelage ku dikevê ser sînorê Swêdê.

Bajarê herî mezin yê Trøndelag Trondheime. Trondheim bajarê sêyemîn mezinê Norwêcê ye. Dêra Nidarosdomen li Trøndelagê dêra sereke ye. Dêr li ser gora Olav den Hellige hatîye avakirin. Olav den Hellige mîrekê vîkînga bû. Wî li dor sala 1000'î jîyan dikir. Ew li hin welatên Ewrûpa gerîyabû û nasîbûna wî bi dînê mesîhîyê çêbûbû. Dûvre wî biryar da ku bitenê dînê mesîhîyê li Norwêc werê pejirandin. Dêra Nidarosdomen li bajarê Trondheime.



Dêra Nidarosdomen Çavkanî: Pixabay.com

Røros navê bajarekî yê li Trøndelagê ye. Bajarê Røros li ser çiyayên bilind ên Rørosê

hatîye avakirin, ew jî ji ber ku di sala 1644'ê de di nava çiyayên Røros cureyekê metalê sifir hat dîtin. Bîrên madenê hatibûn çêkirin. Gel ji bo ku di bîrên madenêde kar bikin mala xwe barkirin û anîn Rørosê. Bi wî awayî Røros hêdî hêdî mezin bû û bû bajar.



Røros Wêne: Lars Geithe, Flickr

Østlandet

Herêma Østlandet, herêma ku herî zêde parêzgeh lê hene ye. Parêzgehên di Østlandet ji Oslo, Vestfold, Telemark, Viken û Innlandet pêk tên. Østlandet herêma herî qelebalix ya Norwêcê ye ku serjimêra wê zêdetirî 2,5 mîlyone. Ev tê wateyê ku hema bêje nivê gelhê Norwêcê li Østlandet'ê jîyan dikê.

Glomma çemê herî dirêj yê Norwêcê ye. Glomma 619 kîlometre dirêje û ji bakurê Trøndelagê ber bi başûrê Østlandet ve

diherike û derketina çemî li bajarê
Fredrikstad'de.



Glomma li Fredrikstadê derdikevê. Çavkanî: Wikipedia

Çiyayên herî bilind ên Norwêcê li
Østlandetê ne. Galdhøpiggen çiyayê herî
bilind yê Norwêcê ye. Çiya 2469 metre
bilinde. Ev tê wateyê ku lûtkeya
Galdhøpiggen ji asta deryayê bi 2469
metreyan bilindtire.



Galdhøpiggen. Çavkanî: Wikimedia Commons



Mjøsa. Çavkanî: Wikipedia

Oslo

Oslo hem paytexta Norwêcê ye, û hem jî
bajarê herî mezin yê Norwêcê ye. Oslo
parêzgeheke cihê ye û dikeve hundirînê
Oslofjordê. Qesr (Slottet), Parlamento
(Storting) û Hikûmet li Osloyê cih digrin.



Stortinget (Parlamento) Wêne: Sergii Figurmyi, Adobestock

Vestfold og Telemark

Parêzgeha Vestfold og Telemark ji beravê
heya çiyayên bilind dirêj dibe.

Gaustadtoppen çiyayê herî bilind yê
Vestfold og Telemarkê ye. Çiyayê
Gaustadtoppen li Rjukanê ye û 1883
metreyan ser asta deryayê dikevê.




*Gaustadtoppen. Di xendekê de em bajarê Rjukan dibînin. Wêne:
Eystein M. Andersen, Riksantikvaren, Flickr*

Farrisvannet li parêzgeha Vestfold og Telemark'ê ye. Farrisvannet navê xwe daye ava mîneralî ya Farris'ê. Lê belê av ne ji Farrisvannet tê, lê ji kanîyên nêzîk ku di bin daristana Bøkeskogen'de ve tê.



Bøkeskogen li Larvik Wêne: Jostein, Adobestock

Tønsberg li Vestfold og Telemarkê ye û bajarê herî kevnarê Norwêcê ye. Bajar li derdora 870'yan de hatîye avakirin. Slottsfjellet li Tønsbergê ye û bajarê herî mezinê wêran, yê li Bakurê Ewrûpayê ye.



Slottsfjellet li Tønsberg Wêne: Celine, Adobestock

Viken

Parêzgeha Viken, parêzgeha herî qelebalix a Norwêcê ye. Parêzgeh bi Swêdê re sînordare. Parêzgeha Viken ji Oslofjordê heya serê çiyê, û ji sînorê Swêdê heya nivê Sør-Norge dirêj dibê.

Bajarên herî mezin yên parêzgehê Drammen, Lillestrøm û Fredrikstad'din.

Innlandet

Innlandet, parêzgeha tekane ye ku şerîda wê ya berava tune ye. Parêzgeh li ser sînorê Swêdê ye. Gola herî mezin ya Norwêcê, Gola Mjøsa ye. Gola Mjøsa li parêzgeha Innlandet'te. Gola Mjøsaye bi Skibladnerê navdare. Skibladner keştiya herî kevnara Norwêcê ye, ku hêjî di merîyetêde ye. Keştiya Skibladnerê di navbera bajarên Eidsvoll, Hamar, Lillehammer û Gjøvik de bawanê vedike.



Skibladner keştiyeke hêlmîye. Wêne: Mahlum, Riksantikvaren

Sørlandet

Li herêma Sørlandet parêzgehek tenê heye, ew jî parêzgeha Agderê ye. Li herêma Sørlandet gelek giravên xweşik yên biçûk û gelek cihê avjenîyê hene.



Skjærgård Kilde: Flickr.com

Kristiansand bajarê herî mezin yê herêma Sørlandet te. Baxçeyê ajalan yê herî mezinê li Norwêcê, li bajarê Kristiansandê. Ji baxçeyê ajalan re «Kristiansand dyrepark» tê gotin. Lê belê piraniya gel weke «Dyreparken» binav dikin.



Lemurer li baxçeyê ajalan yê Kristiansand. Wêne: Kommunal – og - moderniseringsdepartementet

Vestlandet

Parêzgehên li herêma Vestlandet bi Møre og Romsdal, Vestland û Rogaland tên binavkirin. Herêma Vestlandet bi fîyordên xwe yên dirêj û bi çîyayên xwe yên bilind li seranserê cihanê tê naskirin. Sognefjord, fîyordê herî dirêj a li Norwêcê ye, ku 204 kîlometre dirêje.



Balestrand ligger ved Sognefjorden Foto: mariusltu, Adobestock

Bêhtirîn bajarên herêma Vestlandet li ser dirêjahîya beravêne. Bergen, Stavanger, Ålesund û Haugesund bajarên herî mezin yên herêmêne.

Rogaland

Stavanger bajarê herî mezin ê Rogalandê ye. Di salên 1960'an de li Nordsjøen (Deryaya Bakûr) petrol hat kifşkirin. Bîryar hat standin ku navenda pîşesaziyê petrolê li bajarê Stavangerê be danîn. Di serî de çar karmendên nivîsgeha navendî hebûn.

Yek ji wan ji Iraqê bû û navê wî Farûq Al-Kasim bû.



Platforma petrolê Wêne: Wikipedia

Vestland

Bajarî herî mezin yê parêzgeha Vestland bajarê Bergen'e. Bergen bajarê duyêminê mezin yê Norwêcêye, û gelek caran jê re paytexta herêma Vestlandet tê gotin. Bryggen cihekî naskirîyê Bergen'e.



Bryggen i Bergen Foto: Michelle Maria, Pixabay

Gelek sîpan (isbre) li Norwêcê hene. Sîpan dereke ku ji qeşayê pêk tê. Cihin hewqas sarin ku tûcarî qeşa nahelê. Wê demê her sal li wir berf zêde dibê. Dûvre berf dibê qeşa. Dema ku ew cihê qeşayî mezin û giran dibê, ku ji serê çîyê dixîşîkê xwarê. Ji wê re dibêjin sîpan (isbre).

Jostedalsbreen sîpanê herî mezin yê li Norwêcê ye. Jostedalsbreen li parêzgeha Vestland'dê ye.



Jostedalsbreen Foto: Tania Zbrodka, Adobestock



Vidde an jî deşt devereke vekirî û fireh a çîyayî ye. Li deştê gelek dar çênabin, û gewî devî ne. Hardangervidda deşta herî mezin a Norwêcê ye. Deşt li parêzgehên Viken û Vestfold, Vestland û Telemarkê ye.




Hardangervidda Wêne: By-studio, Adobestock

Møre og Romsdal

Ålesund, Molde û Kristiansund bajarên herî mezin yê parêzgeha Møre og Romsdal'in.

Sûlava herî bilind ya Norwêcê li Møre og Romsdal'ê ye, û bi Vinnufossen tê binavkirin. Vøringsfossen sûlava herî navdar ya Norwêcê ye û li parêzgeha Vestland tê dîtin. Li Norwêcê di sûlavên herî bilind de hindik av hene.



Vinnufossen. Wêne: Carl S Bj, Wikipedia

Midsundtrappen derenceya kevirî bi 2200 pêlikene. Derence ji alîyê sherpa'yên Nepal ve hatîye çêkirin.



Derenceyên Kevirî Wêne: Arild, Adobestock

